# PÊVAJOYA AŞTÎYÊ Û CIVAKA DÊMIKRATÎK, HELWESTA R'ÊJÎMA AKP/MHP Û R'ASTÎYÊN DÎROKÎ!

**Ezîz ê Cewo**

Belê, 'Pêvajoya Aştîyê û civaka dêmokratîk', a ku bi banga R'êberê gelê k'urd bir'êz Abdullah Ocalan destpêbûye, didome. Û, ew, wek ku mîmarê wê bi banga xwe naver'ok, wat'e û armanc dayê, di nava civakê da r'ê li pêşîya pêvajoya veguhar'tinên dêmokratîk vedike û ji bo bi aştî ç'areserkirina pirsgirêka k'urdî bingehekê amade dike …

Li vira her tişt anegorî heşmendîya pêşk'evtinên dîrokî hatye diyarkirin, û anegorî wê jî pêvajo didome, lêbelê, pirs di wê da ye, k'a k'i bi çi ç'avî li wê dinihêr'e û çi jê hêvî dike.

Belê, R'êberê T'evgera R'izgarîxwaz a Gelê K'urd hê di destpêkê da dizanibûye, ku *ji bo pirsgirêka k'urdî bi r'êyên aştî û dêmokrasî bê ç'areserkirin, têk'oşîna ç'ekdarî her gava destpêkî ya neç'arî (mecbûrî) ye, lewra ku r'êjîmê ji bilî têr'ora dewletê r'êyek a dinê ya ç'areserîya (bixwîne: t'unekirina!) pirsgirêkê nizanibûye. Ewê heya pirsgirêk û hebûna gelê k' urd bi xwe jî nep'ejirandibûye …*

Wek ku tê xuyan, têk'oşînek a ç'ekdarî a 41 salan pêwîst bû, ji bo ku serokk'omarê T'irkîyayê navê gelê k'urd li r'ex navên gelên t'irk û ereb bîne zimên û behsa biratîya wan bike (balk'êş e, çima t'enê ya van hersê gelan, lê gelên dinê, yên *çerkez, t'ûrkmên, ermenî, asorî, yewnanî…* li k'u man?! – Helbet, ev jî bi serê xwe pirsek e!), û wisa jî li xwe mukur' bê, ku ji sala 1984-an va di welatê wan da hukumet hatine û çûne, û her yekê ji wan jî gotye, ku ewê PKK têk bibin, lê ji wan r'a li hev nehatye!...

Hema li vira jî bersîva wê pirsê dertê holê, k'a çima jinişkêva evê r'êjîma sûck'ar a AKP/MHP bi devê Dewlet Baxçelî behsa axavtina bir'êz Ocalan di Meclîsa T'irkîyayê da kir? …

Û evê jî, ew bi neç'arî dibêje, lewra ku, vekirî tê xuyan, ku ew û hevpeymanîyên wî yên hukumetê heya dawîyê hewl didin, çiqas ji destê wan tê, lîstikên xwe yên siyasî bidomînin û hewl didin, ku pêvavajoyê wek xwe berovajî bikin, an jî têkbibin. Ku ew tiştên ku bi zarê wan tê gotin, tiştekî neç'arî ye, ji ber ku konyûktûrên cîhanê, bi t'aybet jî, yên R'ojhilata navîn, hatine guhar'tin, û ew baş têdigihîjin, k'a çi ji wan tê hêvîkirin (r'asttir dibe, mirov bibêje – *tê xwestin!*). Lêbelê, Erdoxan dê ne Erdoxan be, eger her tiştî wisa hêsan pêk bîne, wek ku ji wî tê xwestin. Ewê lîstikên xwe bidomîne, bide xuyan, xwedêgiravî, bi xwe jî t'erfdarê pêvajoyê ye, lê di r'astîya xwe da dê her tiştî bike, ku ev pêvajo an neçe sêrî, an jî bê lêpovajîkirin û nivîşkan û nîvhero pêk bê. Û hemû gotin û gavên wî yên îro govenîya vê yekê didin.

Bala xwe bidinê, Erdoxan, r'ayedarên r'êjîma wî û çapemenîya bi wan va girêdayî evê pêvajoyê çawa r'aberî civaka T'irkîyayê, K'urdistanê û ya navnet'ewî dikin. Wek ku tê zanîn, pêvajo bi banga mîmarê wê – bir'êz Ocalan a *'Aştî û civaka dêmokratîk'* destpêbûye, û, bi heşmendî, ew wek *'Pêvajoya aştîyê û civaka dêmokratîk'* hatye p'ejirandin, lê zarê wan nager'e, navê wê yê r'esen ê destpêkê bînin zimên. Ew û hemû çapemenî û r'adio-têlêvîzîonên wan ne ku t'enê pêvajoyê wek, qaşo, 'Pêvajoya bêtêr'orkirina T'irkîyayê' navdikin, lê, her weha, wat'eya vê pêvajoyê bi xwe jî diguhêr'in û bi wê sozên xwe yên destpêkê pêk naynin (ku Ocalan bê û di Meclîsa T'irkîyê da biaxive, mafê hêvîyê ji bo wî bê misogerkirin!), û, bi wî awayî, her carekê xwestekek a xwe ya nû didin pêş. Lê, yek e, PKK-ê bi banga r'êberê xwe kongrêya xwe ya XII pêkanî, k'omek a gêrîla bi serk'êşîya hevseroka KCK-ê bir'êz Besê Xozatê bi sembolîk ç'ekên xwe jî dan devê êgir, wek nîşana wê yekê, ku ew wat'eya şer'ê ç'ekdarî bi xwe dişewitînin, ku ew amade ne, şer'ê ç'ekdarî li hember r'êjîmê r'awestînin û pirsgirêka k'urdî bi dîalogê, bi r'êyên siyasî-dêmokrasî ç'areser bikin. Û piştî

vê, bi heşmendî, anegorî hemû pîvanên navnet'ewî yên p'êwendîyên di navbera du t'erefên nak'okîyê yên dijber da, divê r'êjîma AKP/MHP sozên xwe pêk bianyana, yên ku bi zarê hevpeymanîyekî hukumetê – Dewlet Baxçelî hatibûn daxuyandin, û ji bo dîalogê bingehek a qanûnî bihata amadekirin.

Di axavtinên vê dawîyê yên Erdoxan da dîsa heman ç'îr'okên wî yên kevn û xilmetbûyî di wê derbarê da dubare dibin, xwedêgiravî, di welatê wan da gefên têr'orê hene, û ew li dijî wê ditêk'oşin... Em li vira hemû gotinên wî naynin, ne ku t'enê ji bo xatirê wê, ku ew gotinên bêhurmrtîyê ne li hember mirovahîyê û mirovbûnê, lê wisa jî mirov naxwaze heya li ser wan gotina biaxive jî, lê bi vê boneyê dikarin tiştekî bibêjin – belê, di T'irkîyayê da têr'or heye, û ew jî têr'ora dewletê ye, ya ku divê bê r'awestandin! …

Çi bikî, r'astîya cîhana me jî, hema ev e!

Dîsa jî, her çiqas, me di gotarên xwe yên berî vê da dîtinên xwe êdî anîne zimên, ku bi vê r'êjîmê r'a ç'areserî nikare pêk bê, ku ji bo ç'areserîya pirsgirêka k'urdî her r'êyek heye: divê dadgehek a navnet'ewî, ya wek a Nyûrinbêrgê bê damezirandin, û di wê da, wek ku piştî Ser'ê Cîhanê yê Duyem r'êvebir û fermandarên Almanîya faşîst hatibûn darizandin, li ser asta navnet'ewî hemû sûcên vê dewleta di bin navê *'K'omara T'irkîyayê'* da bi sûnî sazkirî bên lêpirsîn û darizandin,[1] ên ku ewê di sed salên hebûna xwe da li hember gelê k'urd û gelên herêmê yên dinê pêkanîne (helbet, bi mînakên hovîtî û sûcên giran ên r'êjîma Erdoxan û hevk'ar û hevp'arên wê va!)…

Lêbelê, ji ber ku em tê digîhîjin, dibe ku konyûnktûrên cîhanê yên îroyîn derfet' û destûrê nedin, ku tiştekî wisa pêk bê, lewra ku T'irkîyayê hemû sûcên dijî mirovahîyê di bin sîwana dewletên gewre yên r'ojavayî, piştr'a jî di bin sîwana NATO-yê da, bi erêkirina wan a bêdeng, bi ç'ekên wan pêkanîne. T'irkîyayê ne ku t'enê li dijî gelê k'urd, lê, her weha, li dijî gelên dinê yên herêmê t'evkujî pêkanîne û erd û aqarên xakên wan dagerkirine, ewê wisa jî li ser beşekî girava Qibrisa dagerkirî K'omara T'irk a Bakûrê Qibrisê r'agîhandye, û ewê bi xwe jî (wek dewletek a endama NATO-yê!) ew bi fermi nas kirye, lêbelê hîç dengek ne ji NATO-yê, ne jî ji sazî û r'êxistinên dinê yên navnet'ewî dernek'etye û îro jî dernayê… Û, eger r'êvebir û serleşkerên T'irkîyayê bên lêpirsîn û darizandin, dê hemû hûrbînîyên hevk'arîya dewletên r'ojavayî yên bi wê dewletê r'a ên dema pêkanîna wan sûcan derên holê…

Lê, her çi jî hebe, dê wisa jî r'ast bibûya, eger dewletên endamên NATO-yê, ne ku t'enê ji bo xatirê mafên gelê k'urd û yên gelên dinê yên herêmê, yên ku ji destê vê dewletê ewqas zulm û zordarî, wêranî, t'alan û t'evkujî dîtine û îro jî dibînin, hîç nebe, ji bo xatirê nivşên xwe yên pêşer'ojê, dadgeheke wisa damezirandina, ya ku sûcên vê dewletê, yên ku wê li dijî mirovahîyê pêk anîne û îro jî pêk tîne, darizandina. Eger na, ew divê baş bizanibin, nivşên wan ên pêşer'ojê dê berhemên tehl ên hevk'arîya dewletên xwe yên bi vê sîstêma dijmirovî r'a tehm bikin, wek berhemên wan sûcên giran, ên ku r'êjîma T'irkîyayê di bin baskê wan dewletan da li dijî mirovahîyê pêk anîne …

Ev darizandin jî, divê ne ku t'enê ji boy navê r'astîya dîrokî û dadwerîyê pêk bê, lê, her weha, ji bo ku r'êjîm ji bo ç'areserîya pirsgirêka k'urdî li şûna siyaseta têr'ora dewletê r'ê û r'êbazên şaristanî biger'e û pêk bîne. Êdî divê ew bûyer dubare nebin, dema ji bo gotinek a biç'ûk a derbarê mafên gelê k'urd da mirov bi hovane dihatin cezakirin, an bê şop dihatin windakirin, dema gund û şênîyên k'urdan dihatin şewitandin û wêrankirin, dema li

---

[1] R'ewşa Sûrîyayê piştî têkçûna r'êjîma baasî, pirsgirêka k'urdî û r'êyên ç'areserîya wê! – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_EWŞA_SÛRÎYAYÊ_PIŞTÎ_TÊK ÇÛNA_R_ÊJÎMA_BAASÎ_PIRSGIRÊKA_K_URDÎ_Û_R_ÊYÊN_Ç_ARESERÎYA_WÊ ; Pêvajo û r'ojeva k'urdî – k'î wan çawa dibîne û têdigihîje! – https://amidakurd.net/tools/saveFile/mod_makale/2301/32; di derbarê pirsa rêyên çareserîya pirsgirêka kurdî da bi berfirehî di pirtûka xudanê gotarê ya "Abdullah Ocalan. Ramana azadîyê, gelê kurd û cîhan" da tê gotin, r'ûp'el: 20 – 30. – https://amidakurd.net/ku/tekst/ABDULLAH_OCALAN_Ramana_azad%C3%AEy%C3%AA_gel%C3%AA_kurd_%C3%BB_c%C3%AEhan

hember gelê medenî t'evkujî pêk tanîn, dema heya navê k'urd jî qedexe bû (ew jî bi destûrî!), dema ji bo axavtin an stranek a k'urdî mirov digirtin û bê şop winda dikirin, dema girtîyên siyasî ji bo şermezarkirina vê bêdadîyê an agir berî bedena xwe didan, an jî di greva birçîbûnê da bi lehengî p'akr'awan dibûn!

Lewra jî, dê bi heşmendî bûya, eger di r'ewşeke weha da sûcên vê r'êjîma dijmirovî bi belge û daneyan ji hêla p'arêzerên pispor ên asta navnet'ewî va bihatana t'omarkirin, di nava wan da wisa jî ew, ên ku Erdoxan bi xwe li xwe mukur' hatye (wek îfadeyekê!) û ew hemû, wek peyt û delîlên pêbawer ên sûcên vê r'êjîma îroyîn û yên berî wê bidana R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (R'NY).

Û, eger konyûnktûrên cîhana îroyîn destûrê nedin, ku Dadgeheke wisa ya navnet'ewî bê damezirandin û dest bi lêpirsîn û darizandina r'êvebirên vê dewleta sûck'ar bike, bila ew wek Şûrê Damoklês li ser serê wan da daliqyayî bimîne, û hert'im bîne bîra wan, ku r'ojekê dê dema bersîvdayînê pêr'a bigihîje, lê ji bo wan, ên ku li pişt van va sekinîbûne, dest li pişta wan xistine, bila ew bibe sembola şermezarîyê, ji bo ku, hîç nebe, r'uhê nivşên wan ji sûck'arîyên pêşîyên xwe r'izgar bibin, û sûcên wisa di cîhanê da êdî pêk neyên! …

Balkêş e, gelo di vê cîhanê da mirovekê bikaribe derê pêş û bibêje, ku, ji bo r'awestandina têr'ora dewletê ji bilî têk'oşîna ç'ekdarî r'êyeke dinê hebûye û îro jî heye? Ango, têk'oşîna gelê k'urd bi serk'êşîya PKK-ê di r'astîya xwe da t'evgerek a dijî têr'orê ye – têr'ora dewletê! …

Û, her piştî têk'oşîna ç'ekdarî ya 41 salan a li dijî têr'ora dewletê r'ewşek a weha dikaribû derk'eta holê, ku Serokk'omarê vê dewleta bêdadîyê, zulm û zordarîyê neç'ar bibe, di dîroka wê da cara yekem di Civîna 32-em a şêwirî û nirxandinê ya partîya xwe (AKP) da li xwe mukur' bê, ku di welatê wan da dewletê li hember gelê k'urd *"şaşîyên sîyasî"* (bixwîne: *sûc!*) pêkanîne. Û wan *"şaşîyan"* ew weha r'êz dike: *kuştin û bê şop windakirina k'urdan ji hêla dewletê va, yên ku kiryarên wan hê jî nehatine diyarkirin, bûyerên ku di zîndana Dîyarbek'irê da pêkhatine, gundên ku ji hêla dewletê va hatine şewitandin, mirovên ku di nava şevekê da hatine k'oçberkirin, dayîkên ku nikaribûne di girtîgehan da li gel zar'okên xwe bi k'urdî biaxivin!*

Û ev hemû sûc in – sûcên giran, ên ku ji hêla dewletê va li hember net'ewa k'urd hatine pêkanîn, lê Erdoxan hema wisa hêsa van hemûyan wek encama *"siaysetên şaş"* ên r'êjîma berî xwe dide xuyan… – Hema wisa!

Qey bibêjî, îro jî heman têr'ora dewletê ne di k'ar da ye, qey bibêjî, îro jî t'evkujî, wêranî û t'alan pêk naên, qey bibêjî, r'êjîm (bixwîne: AKP!) şaredarên bi deng û r'ayên gel hilbijartî nagire û naavêje hebsan û peyayên xwe li şûna wan erk'dar nake, qey bibêjî, îro di girtîgehên vê dewleta zulmê da 15 hezar girtîyên siyasî ên k'urd û ên bi doza k'urdî r'a p'êwendîdar nînin, qey bibêjî, Erdoxan û r'êjîma wî îro jî bi nêzîk va hevk'arîya xwe bi DAÎŞ-ê r'a nadomînin, qey bibêjî, Erdoxan wek emîrê ne formal ê DAÎŞ-ê nehatye p'ejirandin, qey bibêjî, îro jî di T'irkîyayê da girtîyên siyasî nînin, ên ku sûcê wan her t'enê ew bûye, ku helwesta xwe ya piştgirîyê ji bo têk'oşîna Kobanîya k'urdî a dijî DAÎŞ-ê anîne zimên. Qey bibêjî,…! Û mirov k'îjanê bibêje, k'îjanê nebêje! – Yek e, cîhan li hember van r'astîyan ker' û kor û lal e!

Belê, îro di vê pêavjoyê da wisa jî hinek nîşanên guhar'tinên biç'ûk ên şêwazî ji hêla baregeha serokk'omarîyê va tên xuyan, lê ew her ji bo wê ne, ji bo ku bala cîhanê ji k'arên xwe yên r'eş biguhêr'e: hê jî hem t'ecrîda li ser bir'êz Ocalan û êrîşên li ser hêzên gêrîla didomin, hem jî helwest û gotinên dûrî r'astîyê û biç'ûkxistinê dubare dibin. Îro jî gotinên wek ên *"r'êxistina têr'orîst"*, *"divê bên û ç'ekên xwe r'adestî T'irkîyayê bikin"*, *"ev tişt, ên ku îro pêk tên, nîşana têkçûna têr'orê ne"*, *"...T'irkîyake bê têr'or"* û yên wek van ji devê wan kêm nabin...

Cîhana ku xwe şaristanî dihejmêre, serê xwe kirye ber xwe û van ç'îr'okên r'êjîma faşîst guhdar dike. Lewra jî em neç'ar in, ku careke dinê bînin bîra wê, ku ev nak'okîya ç'ekdarî, ku di T'irkîyayê da hebûye û îeo jî heye, encama têr'ora dewletê ye, ku PKK-ê her bi neç'arî, ji bo ku têr'ora dewletê r'awestîne, dest bi têk'oşîna ç'ekdarî kirye, û ji vê hêlê va

ew t'erefekî xwedî mafên r'ewa yê vê nak'okîyê ye, û ev statûsa xwe jî, ewê êdî jizûva li ser asta navnet'ewî misogerkye. Weha:

Hîn 24-ê r'êbendana 1995-an PKK-ê Konvêntsîona (Peyman) Jênêvayê ya p'arastina mafên mirovan (ên leşkeran, ên dîlên şêr', ên birîndaran û kesên medenî) dema p'evçûnên ç'ekdatî binnûs (îmza) kirye û di wê derbarê da di civîna çapemenîyê da li Jênêvayê r'agîhandye.[2] Û ev jî, dema T'irkîya t'u qanûn û pîvanên navnet'ewî nas nake û naşopîne.

PKK bi vê yekê li ser asta navnet'ewî wek t'erefekî p'evçûnên ç'ekdarî hatye naskirin: ango, di vî welatî da şer'ek heye, r'êjîm têr'ora dewletê li hember welatîyên xwe dimeşîne, û PKK-ê jî, ji bo p'arastina mafên wan ên r'ewa li dijî têr'ora dewletê derk'etye. Û têk'oşîna xwe jî, ewê anegorî qanûn û pîvanên navnet'ewî meşandye...

Û ya here girîng jî – Dadgeha bir'yarguhêr' a Bêlgîyayê 28-ê r'êbendana sala 2020-î di Brûssêlê da bir'yra Dadgeha bilind a lêpirsînî ya adara sala 2019-an a di wê derbarê da p'esend kirye, ku *Partîya K'arkerên K'urdistanê ne r'êxistinek a têr'orîstî ye, lê wek yek ji t'erefên p'evçûnên ç'ekdarî tê dîtin*.[3]

Û ji biî vê: Dozgera berê ya Trîbûnala navnet'ewî ya R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (R'NY) Karla Dêl Pontê cotmeha sala 2019-an bang kirye, ku Erdoxan di Dadgeha Haagayê (Laheyê) da darizînin. Ewê daxwuyandye, ku *Erdoxan hêzên xwe birye Sûrîyayê, ji bo ku k'urdan t'une bike. Ku ev jî nayê p'ejirandin, ku divê di derbarê wî da lêpirsînê destpê bikin, ku ew divê ji bo sûcên leşkerî bê darizandin, nabe, ku bihêlin, ew ji wî r'a bimîne. Ku k'urdên Sûrîyaê û T'irkîyayê ji hêla r'êjîma Ankarayê va di bin metirsîyê da ne*.[4]

Ev r'astîyek e, a ku îro li holê ye, û cîhan jî divê ç'avê xwe li ber wê negire!

Û, eger mirov hemû hovîtîyên vê r'êjîma îroyîn a T'irkîyayê, bi yên berî wê r'a di nava t'omerîyekê da, anegorî r'êzik û pîvanên hiqûqa navnet'ewî binirxîne, ew hemû sûcên giran ên dijî mirovahîyê ne, û divê anegorî pîvanên dada navnet'ewî bên lêpirsîn û darizandin!

Lê Erdoxan bi xwe bawer e, ku dê ji wî r'a li hev bê, wan sûcên giran, ên ku ewana li dijî mirovahîyê pêk anîne û îro jî pêk tînin, wek encama *"siyasetên şaş"* bide p'ejirandin.

Û yek ji encamên van planên wî jî, ev, xwedêgiravî, Komîsîona Meclîsê ye, ya ku bingehek a wê ya bi destûrî û qanînî ya r'ewa nîne, lewra ku bi destûrî divê qanûn an zagonek di derbarê ç'areserîya pirsgirêkê da bihata p'ejirandin, û ew komîsîon jî anegorî r'êgez û pîvanên wê bihata damezirandin. Biryara damezirandina wê bi înîtsîatîva serokê Meclîsê ya r'ojane hatye dayîn, ew jî, ji bo pirsa ç'ekberdanê, ne ji bo p'eydakirina r'êyên ç'areserîya pirsgirêkê!... Bi vî şêwazê xwe va, ew her demekê dikare bê betalkirin, eger Şêwra bilind a Meclîsê, an serokê wê bi xwe wê bixwazin. Û, ji ber ku Meclîs, bi hemû sazîyên xwe va di destê AKP-ê da ye, êdî ç'arenûsa Komîsîonê dîyar e!

Dema mirov van hewl û gavên r'êjîmê t'omar dike, dîmenekî balk'êş dertê holê.

Bala xwe bidinê, bi banga R'êber Apo PKK kongrêya xwe ya XII pêkanî û xwe, wek r'êxistin, betal kir, piştr'a dîsa bi banga Serokê xwe k'omek gêrîlayan ç'ekên xwe bi sembolîkî şewitandin (di vê derbarê da li jorê hatye gotin!), û piştî van r'êjîma ku tê zanîn, ne ku t'enê gavan naavêje, lê her weha r'êya r'adestkirina ç'ekan û xwesparîyê li gêrîlayan ferz dike. Lêbelê, di r'astîya xwe da armanca wan ne r'adestkirina ç'ekan e, ne jî xwesparî. Na!

Eger hinek bibêjin, ku Erdoxan û r'êjîma T'irkîyayê weke me PKK nas nakin, ji talebextan r'a, ewê 100% şaş bin. Erdoxan, r'êjîma wî ya îroyîn, yên berî wî, bi hemû peya, r'ayedar û pisporên xwe va PKK-ê û PKK-îyan ji gelekên nava me baştir nas dikin. Ewana, zêdetirî 50 salî di nava hewlên naskirina PKK-ê da bûne...

Hema bala xwe bidin axavtina Erdoxan a vê dawîyê. Ew li xwe mukur' tê, ku ji sala

---

[2] https://www.ozgurpolitika.com/haberi-pkk-1995ten-beri-cenevreye-uyuyor-10455/

[3] https://anfrussian.com/Новости/Вердикт-бельгийского-суда-в-отношении-РПК-может-стать-прецедентом-18379; см. также: «Дело РПК в суде Бельгии прекращено». – https://anfrussian.com/Новости/Дело-РПК-в-суде-Бельгии-прекращено-17949 и «Рим выступает за свободу Оджалана» – https://anfrussian.com/Новости/Рим-выступает-за-свободу-Оджалана-8797.

[4] https://eadaily-com.turbopages.org/eadaily.com/s/ru/news/2019/10/27/karla-del-ponte-prizyvaet-sudit-erdogana-v-gaagskom-tribunale

1984-an û vir va her hukumetek a T'irkîyayê hatye, gotye – ezê PKK-ê têk bibim, lê ji wan r'a li hev nehatye!

Û ev 41 sal in, ji bo r'awestandina têr'ora dewletê ya li hember gelê k'urd PKK-ê têk'oşîna ç'ekdarî dimeşîne, û ev 41 sal in, ku dewlet bi sîstêmî lêger'înên zanistî pêk tîne, sazî û navendên wan ê lêk'olînan di derbarê PKK da lêger'înan pêk tînin, T'irkîya, wek dewletek a endama NATO-yê, agahî, dane û delîl û encamên lêger'înên navendên wê yên di derbarê PKK-ê da ji wê girtine… Lewra jî, ew PKK-ê baş nas dikin, û dizaninin, ku ew bi t'u awahî nikarin wê têkbibn, û bangên wan jî vala ne, û ew bi bingehîn ji bo r'aya giştî ya hindur'ê T'irkîyayê ne. Lewra jî ew bi êrîşên li dijî gêrîlayan, bi k'aranîna ç'ekên k'îmyewî li dijî wana, bi propaganda xwe ya r'eşkirinê va her tiştî dikin, ku PKK-ê neç'arî têk'oşîna ç'ekdarî bikin, lewra ku baş dizanin, ku serk'evtina vê Pêvajoyê dê bê wat'eya têkçûna wan, wek bazirganîya şêr', lewra ku şer' ji bo wan bazirganî ye – bingeha jîyan û hebûna wan!

Û hema li vira ye, ku mirov bi bawer dikare bibêje, ku ewan jî PKK-ê t'am nas nekirine. Ev r'êxistin, bi her endamekî xwe va dê her bir'yarek a R'êberê xwe pêk bîne, lewra ku ew bi bawer e, ku hemû pirsgirêk dikarin her bi r'êyên ku R'êber Apo destnîşan kirine, bên ç'areserkirin – bi r'êyên aştîyê û dêmokrasîyê …

Lewra jî, T'evgera R'izgarîxwaz bi banga R'êberê xwe du gavên sereke avîtine, lê ji vir û pêva ewê êdî bi yekalî t'u tiştekî pêkneyne, heya r'êjîm di vî warî da gavên konkrêt ên praktîk neavêje. – R'êyek a dinê nîne! Di vê boneyê hevserokê KCK-ê bir'êz Cemîl Bayik di bernameya t'aybet a Stêrk-tv da r'ewşa siyasî ya îroyîn, r'êyên ç'areserîya pirsgirêka k'urdî, p'eyama bi dîmen a R'êber Apo, merasima şewitandina ç'ekan a ji hêla gêrîlayan va û pêşk'etinên dawîyê yên Sûrîyayê bi berfirehî nirxandine.[5]

... Belê, wek ku êdî hate gotin, dewleta bi sûnî sazkirî êdî sedasalek e, ku hebûna xwe li ser t'unekirin, wêranî, t'alan, qedexe, bişavtin, t'evkujîya gelê kurd û gelên dinê yên herêmê didomîne. Lêbelê, îro êdî konyûktûrên cîhanê yên nû derk'etine holê, û bi dîrokî dem pêr'a gihîştye, ku ev sîstêm bi binva bê gupar'tin. Lêbelê, divê bê zanîn, ku ev sîstêma dijmirovî dê wisa hêsan dest ji t'avîyên (mewzî) xwe bernede...

Ev pêvajoyek e, ya ku bi r'amana R'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan wat'edar bûye, dest bi meşa xwe ya dîrokî kirye. Û ya ku dê aştî û aramîyê ji T'irkîyayê, K'urdistanê û t'evahîya herêmê r'a bîne jî, hema ev r'aman bi xwe ye. Lewra jî, ew hêzên cîhanî, yên ku berjewendîyên xwe di van guhar'tinan da dibînin, divê vê r'êjîmê neç'ar bikin, ku r'ojekê berî r'ojekê bir'êz Ocalan bê azadkirin, ji bo ku ew bikaribe pêvajoyê bibe sêrî.

Nikare wisa bibe, ku mîmarê pêvajoyê di girîgehê da be, û her t'enê dem bi dem bi r'êya şandan an p'arêzerên xwe p'eyaman bişîne. Ew divê azad be, hemû merc û derfetên pêwîst ji bo wî bên misogerkirin, ji bo ku ew bikaribe bi serbestî danûstandinan bi t'evgera xwe, nûnerên partîyên siyasê yên T'irkîyayê û welatên dinê r'a, bi nûnerên civakên r'ojnamegeran r'a, bi zanîyar, nivîsk'ar û hunermendan r'a dayne. Divê cîhan dengê wî bibihê, lewra ku ew r'aman û dîtinên wî yên di derbarê ç'areserîya pirsgirêkan da ne ku t'enê ji bo T'irkîyaê û K'urdistanê, lê her weha ji bo t'evahîya cîhanê pêwîst û pêkan in…

Û dibe ku li vira hinek bipirsin: "Ê? Wê demê ç'areserîyê çawa bê?"

Bersîva vê pirsê di têgihîştina lêytmotîva vê pêvajoyê da ye, ya ku bir'êz Ocalan di banga xwe ya destpêkê da destnîşan kirye: *"...R'êzgirtina nasnameyan, azadîya r'amanê, r'êxistinbûna dêmokratîk, avakirina civakî, aborî û siyasî ya hemû pêkhatîyan t'enê bi hebûna civak û qada siyasî ya dêmokratîk dikare hebe.* ***Sedsala k'omarê ya duyemîn t'enê, dema ku bi dêmokrasî bê t'acîdarkirin, dikare bibe xwedî yekîtî û berdewamîyeke mayînde.*** (Bi t'aybet bala xwe bidin ser vê hevokê! – E. C.). *Ji dêmokrasîyê pêva t'u r'eyeke dinê ya lêger'îna p'ergalan û pêkanîna wan nîne, ne mumk'ên e..."*[6] Ango, ev tê wê wat'eyê, ku

---

[5] https://anfkurdi.com/rojane/bayik-dive-binesaziya-ku-tekosina-cekdari-derxisti-hole-tune-bikin-199681

[6] https://www.academia.edu/128143358/ROJEVA_ KURDÎ_YA_CÎHANÊ_PÊVAJOYA_ AŞTÎYÊ_Û_PÊŞKE VTINÊN_SÛRÎYAYÊ

dewlet bi xwe jî divê bê guhar'tin, ew divê dêmokratîk bibe. Divê K'T' bibe dewleta hemû pêkhateyan, û li wir mafên hemû gelan bi destûrî weke hev bin, divê ewlehîya her kesekî, k'omekê, civakekê, gelekî bi destûrî bê misogerkirin, divê bi destûrî ç'ek û hemû sazî û p'ergalên cezak'ar (*repressive*) di bin kontrola gel da bin, ji bo ku hîç sewdaserekî wek evên îroyîn nikaribe, art'êşê li dijî gelê medenî k'ar bîne, gund û bajarên wan wêran bike, t'evkujîyan pêk bîne, bê ser û ber siaysetmeder û çalakvanên civakî bigire û bavêje hebsan (îro di girtîgehên K'T' da derdorê 15 hezar girtîyên k'urd ên siyasî hene!), ji bo ku hîç sazîyek a dewletê, an r'ayedarek (ew k'î jî dibe, bila bibe!) nikaribe dest dayne ser şareda-rîyan, r'êvebirên wan, ên ku bi dengê gel hatine hilbijartin, bavêje hebsan û li şûna wan mirovên xwe p'eywirdar bike...

Eger ev hemû pêk bê, dê r'êyên ç'areserîya hemû pirsgirêkan vebinm, gel bi xwe dê ç'arenûsa xwe hilde destê xwe!... Lê, eger na, wê demê kesek nikare garantîyê bide, ku ***k'omarê di sedsala xwe ya duyemîn da bikaribe bibe xwedî yekîtî û berdewamîyeke mayînde!*** – Eger mirov vê bi zimanê gelêrî bibêje, wê derê: eger komar (T'irkîya) xwe neguhêr'e, ewê nikaribe hebûna xwe wisa yekgirtî bidomîne!

Em bi bawer in, ku Erdoxan û Baxçelî evê yekê baş têgihîştine, her pirs di wê da ye, k'a ewê kîjan r'êyê hilbijêrin – r'êya dêmokratîkbûna welatê xwe, an a xwekujîyê, û bi xwe jî bibin tevirk'olên vê dewleta zulmê û li ser k'ilafeyên wê r'ûnîn û r'ondikan bibarînin...

**Û di derbarê r'ewşa K'omara Sûrîyayê, R'ojavayê K'urdistanê û Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê da!**

Ji bo ku r'ewşa Sûrîyayê ya îroyîn bi heşmendî bê r'avekirin, divê mirov veger'e ser hinek nirxandinên destpêkî yên di vê derbarê da – yên pênc meh û nîv berê.

Wê demê gi gotara xwe ya "R'ewşa Sûrîyayê piştî têkçûna r'êjîma baasî, pirsgirêka k'urdî û r'êyên ç'areserîya wê!" da *me bal k'işandibû ser t'erefê r'êgezî yê têgîna "k'etina r'êjîmê", û destnîşan kiribû, ku têkçûna r'êjîma baasî ya Sûrîyayê ne t'enê û ne ewqasî encama êrîş û fişarên hêzên ç'ekdar ên k'omên el-qaydayî yên ji derva bû, çiqasî ji ber r'izîbûna r'êjîmê ya ji hindur'va û ner'azîbûna gel û k'arbidestên dewletê bi xwe, û di encamê da ev k'omên ç'ekdar hatin û li ser k'ilafe û k'elaxê r'êjma her'ifî r'ûniştin...*

*Ku, her çiqas van k'oman, ên ku li ser vê p'êlê di qesra serokk'omarîyê da p'eyda bûn, parlamênto, hemû sazî û dezgehên berê, art'êş û hêzên ewlek'arîyê, partîya BAAS û heya r'êxistina xwe – ya Heyet T'ehrîr eş-Şam (HTŞ) jî betal kirin, û erk'ên serokk'omarîyê û wezîran di nava xwe da p'arvekirin, lê, yek e, bi van hemûyan jî pirsgirêkên vî welatî ç'areser nebûn. Berovajî vê, mirov dikare bibêje. r'ê li pêşîya pirsgirêk û alozîyên nû hate vekirin. Û dest bi pêvajoyeke nû bûye…Lewra jî pirsên di derbarê pêşer'oja vî welatî da ji bersîvan zêdetir in.*

*Û di r'ewşeke weha ya aloz û ne dîyar da ya balk'êş jî ew bû, ku Ahmed Şaraa, yê ku bi xwe ji bo serokk'omarîyê xwe erk'dar kiribû (çiqasî ew wek erk'ek a demî hatibe daxwîyandin jî, ...!), berî ku hewl bide, ku pirsgirêkên Sûrîyayê yên hindur'în ç'areser bike (ew pirsgirêk jî, ewqas p'ir' in, ku li ser serê wan r'a avîtine!) berê xwe dide Erebistana Siûdî û T'irkîyayê…*

*Ji bo çi, çima?* [7]

Û, wek ku wê demê, her weha îro jî, em bi bawer in, wek ku hêzek a van k'oman a r'êxistinî, ya r'êvebirinê, sazûmank'arîyê û jîyandanê nîne, wisa jî heşmendî û têgihîştana wan hemûyan dûrî wan e, lewra ku ew hema di destpêkê da ji bo tiştekî dinê hatine p'erwerde û amadekirin – ji bo kuştin, wêranî û t'alanê!

Di gotara navborî da, me her weha hinek agahî di derbarê wan k'omên ç'ekdar ên

---

[7] https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_EWŞA_SÛRÎYAYÊ_PIŞTÎ_TÊK ÇÛNA_R_ÊJÎMA_BAASÎ_PIRSGIRÊKA_K_URDÎ_Û_R_ÊYÊN_Ç_ARESERÎYA_WÊ

îslama r'adîkal da anîbûn, ên ku nîgara wan a r'astîn dida xuyan, û ew çi ku îro di vî welatî da pêk tê, hîn wê demê zelal dihat xuyan.

Bala xwe bidinê, gelo mirov dikaribû tiştekî erênî ji vê r'êxistinê (HTŞ) hêvî bikira, ya ku li ser p'êla şer'ê navxweyî yê Sûrîyayê li ser bingeha k'omên îslama r'adîkal ên dijberî r'êjîmê yên wek: *Cebhat Fat'h eş-Şam (Cebhat en-Nûsraya* demekê*), Cebhat Ensar ed-Din, Cêyş es-Sûna, Lîva el-Heq û Nûr ed-Dîn ez-Zenkî* pêk hatibûye (berfanbara 2017-an). Paşê bi giştî derdorê sîh k'omên cuda di nava vê r'êxistina da cîhê xwe girtine, û p'ir'anîya endamên wê jî ne sûrîyayî bûne.

Û wê demê (pênc meh û nîv berê!) me pirseke hirêtorîk dabû: "Her çiqas ewî (Eş-Şaraa) bi şêwazî HTŞ betal jî kirye, gelo ew û ç'ekadarên dinê yên îslama r'adîkal ên duh (û ew jî endamên derdorê 30 k'omên cuda!), çiqasî jî benstû (kravat) avîtibin spûyê xwe, cilên ewropîyan wergirtibin, dê bikaribin, gelo, xwe ji r'astîya xwe ya pêkhatinî bişon, û mejû û têgihîştina xwe ya cîhanê biguhêr'in?" – Me wê demê bersîva vê pirsa hrêtorîk ji xwendevanan r'a hiştibû, lê wek ku tê xuyan, mîna wê demê, îro jî pêwîst nake, ku yek bersîva vê pirsê bide, ev k'omên ç'ekdar ên di bin sîwana HTŞ-ê da berevbûyî, bi k'arên xwe yên r'eş bersîva van pirsan û yên dinê didin...

Û îro r'ewş di vî welatî û derdorê wî da ne ku bi r'ojane, lêbelê, bi gav û sehet tê guhar'tin. Bala xwe bidinê, T'om Barakkê baylozê DYA di T'irkîyayê da û nûnerê t'aybet ê pirsên Sûrîyayê r'adibe û dibêje, ku ew t'erefdarê welatê yekgirtî yên yek net'ew û yek dewlet in. Û bermayîyên DAÎŞ-ê, yên ku îro di Şamê da r'ûniştine, hema li ser p'êyan p'eyamê digirin, û dest bi tevkujîyan dibe – piştî elewîyan, vê carê jî durzî bûn armanca êrîşên wan... Piştî vê nûnera Dêpartamênta dewletê ya DYA r'adigihîne, ku pirsa sazîya dewletên Herêma R'ojhilata Navîn a gelên wan welatan bi xwe ye...

Lêbelê, alozî û p'evçûn êdî destpêbûne û r'anawestin!

Û di vê r'ewşê da ç'avê hemûyan li ser Herêma Xweser a R'ojavayê K'urdistanê û Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê ye!

Lê, ji ber ku îro bala ewqas hêzan li ser Sûrîyayê ye, ewqas dewlet li wira berjwendîyên xwe hene, ku mirov nizane, k'a destê k'ê di berîka k'ê da ye... Û her yek ji wan dixaze û hewl dide, ku berjewendîyên xwe bide pêş. Di Şamê da, xwedêgiravî, hukumetek a demkî hatye avakirin, wan k'omên ç'ekdar, ên ku piştî r'eva Beşar Esed li wir berev bûne, di nava xwe da Colanî (Eş-Şaraa) wek serokk'omarê demkî hilbijartine. Û yên ku ew hilbijartine t'u têkilîya wan ne bi Sûrîyayê, ne jî bi sûrîyayan r'a nînin – ew hemû ç'ekdarên DAÎŞî – El-Qaydayî yên ji zêdetirî sîh welatên cîhanê ne. Û ewên ku îro t'evkujîya elewîyan û durzîyan pêkanîne, hema ev ç'ekdar in, yên ku di bin navê eşîrên cuda yên ereban da wan k'arên k'irêt pêk tînin... Û li vira pirs dertê holê, ma hêzên hevpeymanîya navnet'ewî û hukumetên wan agahîyên xwe ji vê r'ewşê nînin? – Ev pirs jî hrêtorîk e, bersîva wê jî di wê bi xwe da heye!

Di vê r'ewşê da R'êvebirîya Xweser a R'ojava çi dikare bike?

Ya sereke, ew dikare desk'evtîyên Şoreşa gelê xwe bip'arêze!

Erê, di navbera fermandarê giştî yê HDS-ê r'êzdar Mazlûm Ebdî û Eş-Şaraa da hinek r'êkevtin pêk hatine, lê di vê r'ewşê da ew nikare hemû destk'evtîyên Şoreşa gelê xwe bike bin metirsîyê û mirovên xwe bike nava wan cîhadîstan, ên ku êdî dane xuyan, ku ew ji bo aştî û aramîya vî welatî nehatine...

Divê r'ewşê da, bi t'aybet jî piştî t'evkujîyên elewîyan û durzîyan, dê r'ast bibûya, eger hêzên navnet'weî, di bin ç'avdêrîya R'êxistina N'etewên Yekbûyî da r'êvebirîyeke demkî (an koordînatsîonek!) a navnet'wî ava bikira, ewê jî ji nûnerên hemû pêkhateyên Sûrîyayê Komîsîona Destûra bingehîm avabikira, ya ku li ser pêşnîyarên pêkhate û herêmên cuda ji bo vî welatî Destûrek amade bikira û bi r'êya r'êfêrêndûmê (dengdana giştî) bip'ejirandana – wek ku ew di welatên şaristanî da pêk tê! Her piştî vê, dema Destûra bingehîn, wek peymana di navbera welatîyan da, hat p'ejirandin, ewana dikaribûn di demek a diyar da amadek'arîyên hilbijartinên herêmî pêbikin (ji gund û t'axan heya her'e-bigihîje bajar û herêman), piştr'a evana jî dikaribûn nûnerên xwe ji bo Paralamêntoya Sûrîyayê hilbijêrin, her piştr'a – serokk'omarekî û hukumetê...

Her bi vî awahî r'êvebirîya Sûrîyayê bi xwe dê bikaribûy pêk bihata, ne ku bi destê k'omên ç'erdevanên navnet'ewî yên îslama r'adîkal, ên ku t'u têk'ilîya xwe bi Sûrîyayê r'a nînin. Û her piştî vê, dema gelê R'ojava û Bakûr-R'ojhilatê Sûrîyayê jî, bi hemû pêkhateyan r'a t'evayî, nûnerên xwe bişîne Parlamêntoyê, û li wira ew (dîsa bi hev r'a!) Destûreke a bingehîn bip'ejirînin û pesend bikin, a ku misogerîya (garantî) mafên xweserîya R'ojava (Bakûr-Rojhilatê Sûrîyê), herêmên elewîyan, durzîyan û yên dinê dide. Û van hemûyan ne ku k'omek a cerdevanên biyanî pêk bînin, lê welatîyên Sûrîyayê bi xwe, bi vîna xwe ya azad, bi r'êyên aştî û dêmokrasîyê. An na, ev êdî çardeh sal in, li R'ojava sîstêmek a şaristanî, a bi r'êvêbirîyek a xweser hatye avakirin, a ku dikare bibe mînak ne ku t'enê ji bo K'omaara Dêmokratîk a Sûrîyaê ya pêşer'ojê, lê, her weha, ji bo t'avahîya Herêma R'ojhilata Navîn.

Di nava gel da hêvî û bawerîyek a mezin li hember R'êvebirîya Xweser gihîştye, ku ewê di her r'ewş û mercan da r'êyên ç'areserîya pirsgirêkan ên here r'ast bibîne û bi mînaka xwe û bi beşdarîya xwe r'ê li pçîya aştî û dêmokrasîyê veke!...

Lêbelê, mixabin, an ji talebextan r'a, dengek an liv û t'evgerek ji sûrîyayîyan bi xwe dernayê, û ev jî, di derbarê welatekî an neteweke "yekgirtî" da gelek tişt dibêje!...

**25. 07. 2025.** **Pyatîgorsk/R'ûsîya**